Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

Belavok derbarê bikaranîna zaniyariyan li gorî mada 13 û 14 ji rêbaza bingehîn ji bo parastina zaniyariyan (DSGVO) ji bo beşdarvanên kursên întegrasiyonê

Kursê întegrasiyonê ji aliyê dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan (BAMF) ve tê birêvebirin û bicihanîn. Ev kurs hêdî li gorî mada § 43 bendê 3 rêzika 2 ji yasaya nişteciîbûnê (AufenthG) ji aliyê xwendegehên prîvat ve tê cîbecêkirin.

Taku ev karê han were encamdan, zaniyariyên taybet bi şexsê we ji aliyên van dezgeh û saziyên jêrîn ve têne tomarkirin û bikaranîn:

- Dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan zaniyariyên taybet bi şexsê we tomardike, heger ew zaniyarî ji boy van sedemên jêrîn re pêwîst bin:
    - Qebûlkirina beşdarbûnê di kursekî întegrasiyonê de li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 5 bendê 1 IntV) û herweha ji bo dubarekirin ne bêtirî jî 300 saetên xwendinê yên kursê întegrasiyonê li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 5 bendê 5 IntV)
    - Efûkirin ji dayina beşekî ji mesrefa kursê întegrasiyonê li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 9 bendê 2 IntV)
    - Dayina beşekî ji mesrefa bilêta çûnûhatinê li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 4a bendê 1 IntV)
    - Vegerandina 50% ji sedî ji mesrefa kursê întegrasiyonê li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 9 bendê 6 IntV)
- Dema ku dezgeha karûbarê biyaniyan (Ausländerbehörde) yan dezgeha dewletê ji bo alkîariyê ji bo kesên bêkar yan dezgeha dewletê ji bo alîkariyê li gorî yasaya alîkariya penaxwazan (Asylbewerberleistungsgesetz) yan dezgeha birêvebirî ya federal (Bundesverwaltungsamt) nameyeke qebûlkirinê yan nameyeke ferzkirina çûyina kursê întegrasiyonê bide we, ev dezgeh zaniyariyên taybet bi şexsê we ve dişînin ji bo dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan. Nexasim ew zaniyariyên derbarê tesbîrkirina mafdariya we û herweha zaniyariyên şandin yan qeydkirina te li ba xwendegehekê ji bo encamdana ezmûnê yan ji bo qeydkirinê. Şandina zaniyariyan ji bo dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan bi tenê ji bo birêvebirin û dayîna mesrefa kursê întegrasiyonê ye, li gorî yasaya nişteciîbûnê (§ 88a bendê 1 rêzika 1 AufenthG).
- Heger dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan hun li gorî rêbaza întegrasiyonê mada § 7 bendê 3 yan 5 IntV ji bo beşdarbûna berwext di kursekî de li cihekî qeydkirin yan heger hun şandin cihekî, wî çaxî dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan wê xwendegehê (heger ev tişt ji bo we misogir be) û wî cihê ku beşdarbûna di kursekî de li ser we ferzkiriye, agahdar dike.
- Xwendegeh yan devera ku kurs lê çêdibe zaniyariyên derbarê qeydkirin û beşdarbûna we di kursê întegrasiyonê de dişîne ji dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan re, heger ev zaniyarî ji bo beşdarbûneke birêk û pêk û ji bo derxistin û radestkirina belgenameyekê derbarê derbaskirina kurs bi serkeftin yan têkçûna we di kurs de yan jî ji bo birêvebirina û dayîna mesrefa kurs re pêwîst bin, li gorî yasaya nişteciîbûnê (§ 88a bendê 1 rêzika 1 AufenthG).

KNr. 630.154a Kurdisch-Kurmanci BAMF 01/2020

- Heger tu bixwazibî, ku li gel beşdarbûna te li kursê întegrasiyonê, zaroka te were guhdankirin li gorî mada § 4 a bendê 2 ji rêbaza hemguncînê (IntV), wî çaxî ew dezgeha guhdana zarokan wê nav û paşnav û roja jidayikbûna zarokê li ba xwe tomar bike. Hêdî ew xwendegha, ku tu li ba wan kursê ziman çêdikî, wê van zaniyariyan ji bo qebûlkirin û hisabkirina mesrefê ji birêvebiriya karûbarê koçberiyê û penaberan re (BAMF) bişîne.
- Heger hun mecbûrbî beşdariyê di kursê întegrasiyonê de bin, wî çaxî xwendegeh anku ew devera ku kurs lê çêdibe wan dezgehan agahdar dike yên ku hun mecbûrî beşdarbûnê kirine, heger we bi rengekî bi rêk û pêk beşdarî di kurs de nekir, li gorî yasaya nişteciîbûnê (§ 88a bendê 1 rêbaza 2 AufenthG).
- Dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan zaniyariyên taybet bi şexsê we, heger hat jê xwestin, dişîne ji dezgeha karûbarê biyaniyan re (Ausländerbehörde) yan dezgeha dewletê ji bo alkîariyê ji bo kesên bêkar yan dezgeha dewletê ji bo alîkariyê li gorî yasaya alîkariya penaxwazan (Asylbewerberleistungsgesetz), heger ev tişt pêwîst be ji bo pejrandina yan mecbûrkirina beşdarbûnê yan ji bo kontrolkirina bicihanîna mercên mecbûrkirina beşdarbûnê û herweha ji bo dirêjkirina mafê rûniştina we (Aufenthaltserlaubnis), li gorî yasaya nişteciîbûnê (§ 88a bendê 1 rêzika 3 AufenthG).

Dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan berpirsiyar e ji bo parastin û emniyeta zaniyariyên taybet bi şexsê we yên ku dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan bi xwe ji we standine yan yên ku ji aliyê dezgehên din ve ketine ber destên wê.

Navûnîşana dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan ev e:

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge

Frankenstraße 210

90461 Nürnberg

Navûnîşana karmendê berpirsiyar ji bo parastina zaniyariyên şexsî li ba dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan ev e:

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge

- Behördlicher Datenschutzbeauftragter -

Frankenstraße 210

90461 Nürnberg

Paşnavê we, nav û roja jidayikabûna we piştî gelekî dereng deh salan û zaniyariyên din piştî gelekî dereng 5 salan têne şewtandin li gorî rêbaza întegrasiyonê (§ 8 bendê 6 IntV).

Mafê we heye, ku hun daxwaziyê ji dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan bikin, ku bikaranîna zaniyariyên we yên şexsî were bi sînorkirin, heger hun bi rengekî beraqil behweriya dezgeha karûbarê koçberiyê û penaberan bi wê yekê bînin, ku berjwendiyên we yên layîqî parastinê yan berjewendiyên layîqî parastinê yên kesekî din bi rêya bikaranîna van zaniyariyan têne sînorkirin. Hêdî ev zaniyariyên we wê bi tenê hingî werin bikaranîn, heger ev tişt ji berjwendiyên giştî re pêwîst be. Û her wekî din jî mafê we heye ku hun agahdariyan werbigrin û hun zaniyariyên xwe yên şexsî serrast bikin û herweha zaniyariyên xwe jêbibin, heger hat û ew zaniyarî bi rengekî ne yasayî hatin bikaranîn.

Her wekî din jî mafê we heye, ku hun giliyê xwe li ba dezgeha çavdêr ji bo parastina zaniyariyan bikin:

Bundesbeauftragte für den Datenschutz und die Informationsfreiheit

Husarenstraße 30

53117 Bonn